



Research Article

International Journal of Kurdish Studies

11 (2), pp. 609-627

<http://www.ijoks.com>

**Qeydên Dengên Kamîran Bedirxan di Arşîva Dengan a Zanîngeha Humboldt-Berlînê de**

**Necat KESKIN<sup>1</sup>**

Received: Jul 8, 2025

Accepted: Sep 14, 2025

**Kurte**

Qeydkirina dengan bi îcada fonografê ya di dawiya sedsala 19mîn de pêkan bû. Bi rêya vê îcadê, êdî li her derê cihanê deng bi hesanî dikaribûn bîr qeydkirin. Û ji ber ku qeydî li cihên curbicur ên cihanê dihatin kirin û bi rastî jî li cihên dûr belawela bûn, pêdivî bi hilanîna wan li deverên navêndî çêbû. Li ser vê yekê di destpêka sedsala 20mîn de li Ewropayê arşîvên dengan hatin avakirin ku yek ji wan jî Arşîva Fonogramê ya Berlînê ye ku di 1900î de ji hêla profesor Carl Stumpf ve di bin banê Enstîtuya Derûnnasiyê ya Zanîngeha Berlînê (îro Zanîngeha Humboldt) de hatiye avakirin. Arşîva Fonogramê ya Berlînê îro di bin banê Muzeya Etnolojiyê ya Berlînê de tê parastin û ligel çend muzeyên din, di bin banê Humboldt Forumê de kar dike. Ligel vê arşîva navborî, di bin banê Zanîngeha Humboldtê de jî arşîveke dengan (Lautarchiv) heye. Di vê arşîvê de em rastî çend qeydên kurdî jî hatin; dengên Kamîran Bedirxan. Wekî tê zanîn, Kamîran Bedirxan kesayetekî navdar ê kurdan e û di dîroka siyasî, civakî û çandî ya kurdan de cihekî wî yê sereke heye. Loma jî hebûn û peyda kirina qeydên dengên wî di arşîveke wisa navdar de jî giring e. Di arşîvê de bi tevahî çar qeydî hebûn ku li gorî katalogê di 1937an de li arşîvê hatine zêdekirin. Ew ji koloniya fransî, ji derdora Helebê hatine tomarkirin. Di wê demê de Kamîran Bedirxan jî li vê herêmê dijiya û çalakiyên xwe yên entellektuelî dimeşandin. Derbarê bê ev qeydî çawa hatine tomarkirin an jî çawa bo Berlînê hatin şandin tu agahî tune ne. Lê ihtimaleke mezin bi rêya têkiliyên Kamîran Bedirxan ên şexsî ev qeydî gihaştine Almanyayê. Piştî hayjêbûna me ji van qeydan me bi berpirsiyarên arşîvê re têkilî danî û bi peymanekê wan jî ev deng wek MP3 ji me re şandin. Li gorî lêgerînên me, heya niha derbarê van qeydên navborî tu xebat û lêkolîn tune ne. Bi vê xebatê re ev arşîv derdikeve meydanê û ev jî xweserî û giringiya vê xebata berdest zêdetir dike. Ji vî alî ve tevkeriyekê jî li mîrata çandî ya kurdî dike. Di vê gotarê de derbarê arşîvê; derbarê qeydên navborî û deşîfrasyona wan û her weha nixandinek li ser naverok û giringiya wan cih digire. Em hêvî dikin ku serkeftinên me, her çend kêr bin jî, ji bo lêgerîna qeydên din ên kurdî yên di arşîvên cuda yên cihanê de bibin alîkar.

**Peyvên sereke:** Arşîva Dengan, Kamîran Bedirxan, Kurdî, Lautarchiv, Zanîngeha Humboldt-Universität- Berlin

**Recommended citation:**

Keskin, N. (2025). Qeydên Dengên Kamîran Bedirxan di Arşîva Dengan a Zanîngeha Humboldt-Berlînê de. *International Journal of Kurdish Studies*, Volume 11 (2), 609-627, DOI: <https://doi.org/10.21600/ijoks.1737878>

<sup>1</sup> Assoc. Prof. Dr., Mardin Artuklu University, Institute of Living Languages, Department of Kurdish Language and Culture, e-mail: [neecatkeskin@artuklu.edu.tr](mailto:neecatkeskin@artuklu.edu.tr), ORCID: <https://orcid.org/0000-0003-0884-1309>

## Kamiran Bedirxan's Voice Recordings in the Sound Archive (Lautarchiv) of Humboldt University- Berlin

### Abstract

Recording sounds became possible with the invention of the phonograph at the end of the 19th century. Through this invention, sounds could be recorded easily anywhere in the World. And because the recordings were made in different parts of the World and were indeed dispersed in far off and distant locations, there came about a need to store them in centralized places. Accordingly, sound archives were established in Europe at the beginning of the 20th century; one of them was the Berlin Phonogram Archive, established in 1900 by Professor Carl Stumpf under the auspices of the Institute of Psychology of the University of Berlin (today Humboldt University). The Berlin Phonogram Archive is preserved under the auspices of the Berlin Museum of Ethnology and works with several other museums under the auspices of the Humboldt Forum. In addition to the aforementioned Archive, there is also a sound archive (Lautarchiv) under the auspices of the Humboldt University. In the latter archive, we came across some Kurdish recordings, the voice of Kamiran Bedirxan (as Kamuran Ali Bedir-Chan in the archive). As is known, Kamiran Bedirxan is a famous Kurdish figure and has a central place in the Kurdish political, social and cultural history. Therefore, the existence and finding of recordings of his voice in such a famous archive is significant. There were altogether four recordings, which according to the catalogue were added to the archive in 1937. They were recorded from the French colony, round about Aleppo. At that time, Kamiran Bedirxan was also living and doing his intellectual activities in this region. There is no information about how the recordings were made or how they were sent to Berlin. Most likely they reached Germany through personal contacts of Kamiran Bedirxan himself. After becoming aware of these recordings, we contacted the archive managers and under agreement, they sent us the audio as MP3. According to our research, there has been no study or research on these records. This archive is coming to light with this work and this also increases the uniqueness and importance of our study. In this regard, it also contributes to the Kurdish cultural heritage. This article includes information about the archive; about the aforementioned recordings and their decoding, as well as an assessment of their content and importance. We hope that our successes however meagre will aid the search for other Kurdish recordings in various archives around the world.

**Keywords:** Humboldt University- Berlin, Kamiran Bedirxan, Kurdish, Sound archive, Lautarchiv.

### Destpêk

Deng di wateya axaftin û gotinê de amûra herî sereke ya ragihandinê ya mirovahiyê ye. Berê gotin hebû û bi rêya gotinê hafîzeyê kolektîf a civakê nifş bi nifş dihat veguhastin. Bi gotineke din hafîze di “deng” de parastî bû, û ev deng jî li ser milên bargirên hafîzeyê çandî bûn, wekî bard, aşîk, dengbêj, mitirb, grîot û yê din.<sup>2</sup> Ligel vê giringiya wê, parastina “deng” bi awayekî

<sup>2</sup> Xebata Walter J. Ong (2003) ya derbarê çanda devkî û nivîskî, vê rewşa çanda devkî û di nav de rola gotinê û bargirên çandê baş dinirxîne û asoyeke berfireh dide mirov. Ji bo nirxandineke berawerdi derbarê dengbêj û aşîkan bnr. Kardaş (2017); Ji bo mitirban û rola wan a civakî bnr. Keskin (2016).

din ne pêkan bû. Mirovahiyê dikarîbû dîtinên xwe qeyd bikin bi rêya xêzkirinê, lê bihîstin ne pêkan bû û wek xeyalekê di dîrokê de bû heya îcada fonografê (phonograph).

Ceribandinên qeydkirina deng di nîveka sedsala 19mîn de dest pê dikin. Edouard-Leon Scott di 1857an de cîhazeke bi navê fonotografê îcad dike ku dikare deng qeyd bike. Lêbelê ev cîhaz tenê dikarîbû deng qeyd bike, lê guhdarkirina wan ne pêkan bû. Piştî vê ceribandinê di sala 1877an de Thomas Edison amûrekê bi navê Fonografê îcad dike ku bi rêya wê hem deng dikarin bînin qeyd kirin û hem jî ev deng ji nû ve dikarin bînin guhdarkirin. Piştî îcada Edison, di 1888an de Emile Berliner jî bi navê Gramofon amûreke nû pêşkêş dike û patenta wê dîstine. Ew jî wek a Edison hem deng qeyd dike û hem jî ji nû ve guhdarkirina wan pêkan dike. Gramofona Berlinerê, di çarîka pêşî a sedsala 20mîn de, di salên 1920an de ji aliyê tîcarî ve dide pêşiya Fonografê (Shorter & Borwick, 1980: 574; Harrison, 1987: 9).

Pêkanbûna qeydkirina deng rê li ber avakirina arşîvên deng jî vekir û xebatên zanistî yên li ser deng û bi taybetî muzîkê hesantir kir. Êdî li her aliyê cîhanê deng dikarîbûn bînin qeyd kirin û bînin tomakirin. Li gorî zanînan heyî etnologê Emerîkî Jesse Walter Fewkes di salên 1889-90î de cara pêşî fonograf di lêkolîna xwe ya sehayî ya li nav xwecihiyên Emerîkî de bi kar aniye (Harrison, 1997: 10). Bi rêya vê tomakirinê zanyarên li ser deng û bi taybetî muzîkê kar dikirin bi hesanî dikarîbûn li ser van deng bi berfirehî bixebitin, bisekinînin, pêşde bibin, paşde bînin, hêdî û bilez bikin, careke din ji nû ve guhdar bikin.

Bi pêkanbûna qeydkirina û tomakirina deng pêwîstiya parastina van dengên qeydkirî yên cihê cuda yên cîhanê derket holê û vê pêwîstiyê jî bi xwe re arşîvên deng anîn. Sigmund Exner, derûnnasê naskirî li Zanîngeha Viyanayê di 1899an de ji bo avakirina arşîveke fonografê planekê amade dike. Pêşniyara wî ne tenê tomakirin û parastina muzîkê ye, lêbelê di heman demê de ev arşîv qeydkirina ziman û zaravayan û dengên kesayetiyên navdar jî dihewîne.

Ji 1900î pê de, ji bo tomakirin, parastin û li ser xebatkirina qeydên fonografê li Ewropayê arşîvên deng ên zanistî hatin avakirin: Arşîva fonogramê ya Viyanayê, piştî ya li Berlînê û piştî jî berhevokên fonografîk ên li zanîngehên Parîs, Leiden, Zurich û St. Petersburgê hinek ji wan in (Birdsall & Tkaczyk, 2019).

Yek ji van arşîvên herî navdar jî Arşîva Phonogramê ya Berlînê ye (Das Berliner Phonogram-Archiv) ku di 1900î de ji hêla profesor Carl Stumpf ve di bin banê Enstîtuya Derûnnasiyê ya

Zanîngeha Berlînê [îro Zanîngeha Humboldt] de hatiye avakirin (Koch & Wiedmann & Ziegler, 2004). Di malpera Zanîngeha Humboldtê de derbarê arşîvê de ev agahî hene:<sup>3</sup>

Arşîva Fonograma Berlînê, bi tomarên xwe yên pêşîn ji sala 1900an, heta sala 1923an aîdî Enstîtuya Psikolojiyê ya Zanîngeha wê demê Friedrich Wilhelm (niha Zanîngeha Humboldt a Berlînê) bû. Ew zêdetirî 16,000 fonogramên orîjînal ên ku di navbera salên 1893 û 1943an de li herêmên cuda yên cîhanê hatine tomarkirin, dihevin. Ev berhevok bi nêzikî 2,000 plakên kevîrî [tr. taş Plak] ên bi muzîka ne-Ewropî ve hatiye temamkirin. Di sala 1934an de, ev koleksiyon tevî Muzeya Etnolojiyê (îro: Muzeya Etnolojiyê - Muzeyên Dewletî yên Berlînê) bû.

Îro ev koleksiyon di bin banê *Muzeya Etnolojiyê ya Berlînê* de tê parastin û îro bi çend muzeyên din re di bin banê *Humboldt Forum* de kar dîkin.<sup>4</sup> Di sala 1999an de jî ji ber berhevokên fonogramê ku tê de cih digirin, ji aliyê UNESCO ve bi pileya “hafîzeyê dinyayê” tê qeydkirin (Koch & Wiedmann & Ziegler, 2004).<sup>5</sup>

Ji bilî arşîva fonogramê ya Berlînê, di bin banê Zanîngeha Humboldtê de jî arşîveke deng (Lautarchiv) heye ku qeydên dengê Kamîran Bedirxan jî me di nav vê arşîvê de peyda kirin. Li ser malperê, derbarê arşîvê de ev agahî hatine dayîn:

Arşîva Deng a Zanîngeha Humboldt a Berlînê [Lautarchiv] xwedî berhevokeke akustîk e ku ji nêzikî 10,000 plakên kevîrî [tr. taş plak], silindirên mûm û kasetan pêk tê. Koleksiyon bi giranî ji sê berhevokên sereke pêk tê: 1. Tomarkirinên ku ji hêla Komîsyona Fonografîk a Prusiyayê ve di kampên esîrên şer ên Alman de ji 1915 heta 1918 hatine kirin, 2. Dengên kesayetiyên navdar ên Împeratoriya Alman û Komara Weimar, û 3. berhevokek ji zarava û devokên almanî. Arşîva Deng yek ji arşîvên deng ên herî kevin li Ewropayê ye û bi balkişandina xwe ya li ser berjewendiyên fonetîk û zimannasî derdikeve pêş.<sup>6</sup>

Her weha divê bê gotin ku arşîv ne tenê dengên li Ewropayê, lêbelê, wekî di mînaka me de jî tê dîtin, dengên din ên deverên din ên cîhanê jî dihevin. Û jî vî alî ve jî ew jî wek hafîzeyê cihanî dikare bê nîrxandin. Dengê Kamîran Bedirxan (wekî di qeydan de derbas dibe; Prinz Kamuran an jî Kamuran Ali Bedir-Chan) ku ji “koloniya fransî” hatine wergirtin jî mînaka vê yekê ye. Berî ku em derbasî agahiyên derbarê van qeydan bibin, bi kurtasî em ê behsa pêvajoya bidestxistina wan dengên bikin.<sup>7</sup>

### ***Çend gotin li ser serboriya bidestxistina dengên Kamîran Bedirxan***

<sup>3</sup> <https://www.sammlungen.hu-berlin.de/sammlungen/phonogramm-archiv/> (15.05.2025)

<sup>4</sup> Ji bo agahiyên derbarê Humboldt forum bnr. <https://www.humboldtforum.org/en/about/> (15.05.2025)

<sup>5</sup> Ji bo agahiyên berfireh derbarê arşîva fonogramê ya Berlînê bnr. Koch & Wiedmann & Ziegler (2004).

<sup>6</sup> Ji bo agahiyên berfireh derbarê arşîvê de bnr. <https://www.lautarchiv.hu-berlin.de/> (15.05.2025).

<sup>7</sup> Derbarê jîyan û berhemên Kamîran Bedirxan xebatên berdest peyda dibin, lewma jî me di vê xebatê de bi taybetî cih neda agahiyên berfireh li ser jîyan û berhemên wî. Ji bo agahiyên berfireh derbarê jiyana Kamîran Bedirxan bnr. Henning (2018); Henning û yên din (2019); Keskin (2018; 2025).

Peydakirina dengên di pêvajoya projeya post-doktorayê ya di navbera 2018-2021ê de dest pê kir. Di wê maweyê de tenê haya me ji hebûna dengên çêbû, lê peydakirina wan pêkan nebû. Di 2024an me bi kesên berpirsiyar ên Lautarchivê, Dr. Christopher Li û Charly re, bi rêya maîlan careke din têkilî danî û di encamê de jî bi peymanekê ev deng wek dosyayên MP3 bo me rê kirin.<sup>8</sup> Piştî bidestxistinê ev qeydî hatin deşîfrekirin. Ev qeydên dîrokî ne, loma jî ji bilî danasînê, armanceke vê xebatê jî ew e ku ev qeydên dîrokî bi halê nivîskî jî li ber destê lêkolîner û xwînerên sehaya kurdî bin. Ji bilî dîrokîbûna wan, li gorî me ev deng ji çend hêlên din ve jî giring in, wekî;

1- Serbazê inglîz Charles Noel di rojnivîskên xwe de dibêje ku Kamiran Bedirxan kurmancî nizanî bû (Noel, 2014: 108). Her çiqasî di xebatên din ên li ser Bedirxaniyan de em rastî vê yekê neyên jî, dîsa dibe ku di dema Noel de Kamiran baş kurdî nizanibe. Ev qeydên dengên ku di 1937an de ketine arşîvê (an jî hatine qeydkirin) kurdiyeke safî ya Kamiran Bedirxan bi me dide naskirin.

2- Dengê kurdî di arşîvan de kême in. Di nav berhevkarîyên oryantalîstên alman de hinek peyda dibin ku di destpêka sedsala 20mîn de hatine kirin. Lê ev deng bi tîknolojiya wê demê hatiye kirin û zêde ne zelal in. Wekî din bi rêya muzîkjenên ermen ku Piştî şerê Cîhanê yê Yekemîn –an jî di dema şer de- koçî Emerîka kirine em rastî dengên stranên kurdî jî tên. Ev dengê ku me peyda û deşîfre kirine yê rewşenbîrekî kurd in ku bi navê xwe û xebatên xwe di dîroka kurdî û di nav xebatên kurdî de cihekî giring digire.


3- Hawar, Ronahî, Stêr û Roja Nû kovar û rojnameyên giring in di dîroka xebatên kurdî û ji bo kurdî kêlên sereke ne. Di wan de em rastî gelek nimuneyên edebiyata gelêrî, helbest û serpêhatîyan dibin û wan dixwînin, lê wekî deng bihîstin û guhdarkirina wan dihêle ku li ber çavê mirov zindî bibin. Bi vê yekê em hay ji dengên wê demê jî dibin.

### Agahiyên derbarê qeydên dengên di arşîvê de

Di arşîva dengên a Zanîngeha Humboldt-Berlînê de di bin sernavê lêgerîna “kurdisch-kurdî” de 4 bijarde derdikevin hemerî me ku her çar jî dengên Kamiran Bedirxan in, ango wek di arşîvê de hatiye binavkirin, Kamuran Ali Bedir-Chan. Ev çar deng ligel kurtkirina lautarchiv-LA û

<sup>8</sup> Pêwîst e dubare bê gotin ku ev deng ji arşîva dengên a Zanîngeha Humboldt a Berlînê hatine wergirtin. Li vir careke din ez ji bo alîkariya wan spasî serokê berhevoka Lautarchiv a Humboldt-Universität zu Berlin birêz Dr. Christopher Li û her weha Charly Bischoff dikim.

hejmarên wan wisa hatine qeydkirin: LA 1474; LA 1475; LA 1478; LA 1479.<sup>9</sup> Li gorî agahiyên serî (bnr. wêne-1) ev deng ji “koloniya fransî” hatine wergirtin û “vegêran” (erzählung) in.



Wêne 1: Qeydên dengên li ser malperê bi vî awayî derdikevin- <https://www.sammlungen.hu-berlin.de/objekte/stichworte/6582/>

Gava mirov li ser van ditikîne, agahiyên berfireh derdikevin pêşîya mirov. Li ser ‘ev deng çawa hatine qeydkirin û çawa li arşîvê (Lautarşîv- Arşîva Deng) hatine tomarkirin’ tu agahî xuya nakin, lêbelê li gorî agahiyên heyî ev deng di 1937an de li Suriyeyê hatine tomarkirin ku wê demê di bin hikmê Fransayê de bû. Wekî agahiyên berdest em dizanin ku Kamîran Bedirxan li Bêrudê di radyoya rojhilat (Radio-Orient an jî Levant)<sup>10</sup> a fransî de xebitiye, nûçe gotine (Henning, 2018: 371; 468; 583) û ihtimaleke mezin çîrok û meselok jî gotine.<sup>11</sup> Ev deşîfreyên dengên ku di vê xebatê de em pêşkêş dikin dibe ku hinek dengên ji wê radyoyê bin.

<sup>9</sup> Dosyayên dengên ku wek MP3 bo me hatine şandin jî bi vî awayî ne: 14740100; 14750100; 14780100; 14790100

<sup>10</sup> Derbarê radyoyê de agahiyên zêde me peyda nekin. Lê hinek agahiyên kurt hene ku di destpêkê wek “radio-liban/lebanon” hatiye binavkirin. Ji bo van kurte agahiyan bnr. <https://www.lorientlejour.com/article/1066364/les-80-ans-de-radio-liban-que-reste-t-il-de-la-periode-doree-.html> (19.06.2025).

<sup>11</sup> Ligel gelek hewldanan û ligel lêpîrsîna ji Enstîtuya Kurdî ya Parîsê jî me ev deng peyda nekin. Belkî ev xebata berdest bibe wesîle ji bo lêgerîneke bi vî rengî.

Wekî li jor jî hate gotin çar qeydên dengên hene di arşîvê de. Di destpêka her qeydiyê de agahiyeke xelet a bi vî rengî wisa hatiye nivîsandin:

“Axêver ji aliyê olê ve Zerdeştî ye û ji ber vê yekê aîdî Zerdeştîyê ye. S.M.”

Rast e ku bala Kamiran û Celadet û her weha rewşenbîrên kurdî û yên fransî yên wê demê jî li ser Kurdên Êzîdî bû, lê agahiyeke berdest tune ye ka Kamiran Bedirxan li ser baweriya Êzîdî bû an jî Zerduştî bû. Her weha, ne di nivîsên wî de, ne jî di bîranînên wî de û ne jî di xebatên derbarê wî de em rastî agahiyeke wisa nayên. Ji wê zededir, bo Kamiran ya giring kurdbûn e û di vê çarçoveyê de tu ferqa elewî, sunnî û êzîdîyan li cem wî/wan tune ye. Wekî di helbesteke xwe de tîne ziman, ew tev; *Kurd in, ne cûda ji dar û ra ne /Bin destê Xwedê û yek xwedan e* (Bedirxan, 2025; 73-74).

Lewma ev wek xeletiyekê ye ku di destpêka van dengên de ji bo ravekirinê hatiye nivîsandin. Ev agahiya xelet dibe ku ji naveroka van “vegotinên” peyda bibe, ji ber ku di van qeydan de dia û peyvên têkildarî êzîdî û ezdiyatîyê hene.

Li ser malperê derbarê her qeydiyê ev agahî hene, wek; cure, hejmar, hejmara qeydkirinê, sernav (ê vegotinê), dîroka tomarkirinê, formata qeydiyê, vebêjer, dem, çawanî û ji ku hatiya peydakirin. Li gorî van xalan agahiyên katalogî yên dengên wisa ne:

#### 1) Qeydiya yekemîn: LA 1474 (wêne 2)

Ev deng li gorî ku ji wêne jî em fam dikin, wek “belgeya deng”; bi ID ya 22969, hejmara envanterê LA 1474 û bi sernavê “Çend gotin ji serok [Axayê] Herekol” di arşîvê hatiye qeydkirin. Dîsa li gorî agahiyan dîroka qeydiyê 1937-01-28 e. Ji koloniya fransî, Bakûrê Suriyeyê, ji derdora Helebê hatiye qeydkirin û vebêjer Kamiran Ali Bedirxan e (Kamuran Ali Bedir-Chan). Formata qeydiyê 30 cm û dem jî 4 deqîqe ye.

• Lautarchiv

### Kurdisch (französische Kolonie), Erzählung - LA 1474

1) Der Sprecher ist von der Religionszugehörigkeit her Zoroastrier und gehört somit dem Zoroastrismus an. S.M.

#### Detailangaben

|                   |                                                                                                                                                                                  |
|-------------------|----------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------|
| Eintragstyp       | Tondokumente                                                                                                                                                                     |
| ID                | 22969                                                                                                                                                                            |
| Inventar-Nr.      | LA 1474                                                                                                                                                                          |
| Sachtitel         | Kurdisch, "Einige Worte des Häuptlings Herekof"                                                                                                                                  |
| Datierung         | 1937-01-28                                                                                                                                                                       |
| Beschriftung      | a) [gedruckt:] Institut für Lautforschung a.d. Universität Berlin, Sprachaufnahme, [handschriftlich, mit Bleistift:] LA 1474, Kurdisch; b) [maschinenschriftlich:] P, XX LA 1474 |
| Format            | 30 cm                                                                                                                                                                            |
| Sprecher / Sänger | Kamuran Ali Bedir-Chan                                                                                                                                                           |
| Aufnahmedauer     | 04:00 min                                                                                                                                                                        |
| Erhaltungszustand | gut                                                                                                                                                                              |
| Herkunft          | [Nordsyrien]/ Mactale-Syrien [?], nahe Aleppo [Aleppo, arab. Halab]                                                                                                              |
| Sprecher          |                                                                                                                                                                                  |
| Land (historisch) | französische Kolonie                                                                                                                                                             |

Wêne 2. Agahiyên derbarê LA 1474- <https://www.sammlungen.hu-berlin.de/objekte/lautarchiv/22969/>

## 2) Qeydiya duyemîn: LA 1475 (wêne 3)

Ev qeydî jî wek “belgeya deng”; bi ID ya 22970, hejmara envanterê LA 1475 û bi sernavê Fabla Kurdî- “Bilûrvan û dûvê qutkirî” di arşivê hatiye qeydkirin.<sup>12</sup> Dîroka qeydiyê dîsa 1937-01-28 e. Ji koloniya fransî, Bakûrê Suriyeyê, ji derdora Helebê hatiye qeydkirin û vebêjer Kamiran Ali Bedirxan e (Kamuran Ali Bedir-Chan). Formata qeydiyê 30 cm û dem jî 4 deqîqe û 3 saniye ye.

<sup>12</sup> Kamiran Bedirxan navê vê çîrokê di qeydiyê de wek “Tirba Spî û dûvê peritandî” vedibêje.

|                                                                                                                |                                                                                                                                                                                  |
|----------------------------------------------------------------------------------------------------------------|----------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------|
| Lautarchiv                                                                                                     |                                                                                                                                                                                  |
| <b>Kurdisch (französische Kolonie), Erzählung - LA 1475</b>                                                    |                                                                                                                                                                                  |
| 1) Der Sprecher ist von der Religionszugehörigkeit her Zoroastrier und gehört somit dem Zoroastrismus an. S.M. |                                                                                                                                                                                  |
| <b>Detailangaben</b>                                                                                           |                                                                                                                                                                                  |
| Eintragstyp                                                                                                    | Tondokumente                                                                                                                                                                     |
| ID                                                                                                             | 22970                                                                                                                                                                            |
| Inventar-Nr.                                                                                                   | LA 1475                                                                                                                                                                          |
| Sachtitel                                                                                                      | Kurdisch, Fabel: "Der Flötenspieler und der abgerissene Schwanz."                                                                                                                |
| Datierung                                                                                                      | 1937-01-28                                                                                                                                                                       |
| Beschriftung                                                                                                   | a) [gedruckt:] Institut für Lautforschung a.d. Universität Berlin, Sprachaufnahme, [handschriftlich, mit Bleistift:] LA 1475, Kurdisch; b) [maschinenschriftlich:] P, XX LA 1475 |
| Format                                                                                                         | 30 cm                                                                                                                                                                            |
| Sprecher / Sänger                                                                                              | Kamuran Ali Bedir-Chan                                                                                                                                                           |
| Aufnahmedauer                                                                                                  | 04:03 min                                                                                                                                                                        |
| Erhaltungszustand                                                                                              | gut                                                                                                                                                                              |
| Herkunft                                                                                                       | [Nordsyrien]/ Mactale-Syrien [?], nahe Alepo [Aleppo, arab. Halab]                                                                                                               |
| Sprecher                                                                                                       |                                                                                                                                                                                  |
| Land (historisch)                                                                                              | französische Kolonie                                                                                                                                                             |

Wêne 3: Agahiyên derbarê LA 1475- <https://www.sammlungen.hu-berlin.de/objekte/lautarchiv/22970/>

### 3) Qeydiya sêyemîn: LA 1478 (wêne 4)

Qeydiya sêyemîn jî wek “belgeya deng”; bi ID ya 22973, hejmara envanterê LA 1478 û bi sernavê “Du diayên kurdên êzîdî (şefeq û rojhilat)” di arşîvê hatiye qeydkirin.<sup>13</sup> Dîroka qeydiyê dîsa 1937-01-28 e. Cihê qeydiyê jî wek yên din; koloniya fransî, Bakûrê Suriyeyê, derdora Helebê ye. Vebêjer Kamiran Ali Bedirxan e (Kamuran Ali Bedir-Chan). Formata qeydiyê 30 cm û dem jî 4 deqîqe û 11 saniye ye.

<sup>13</sup> Kamiran Bedirxan van diayan wek “Nivêja Spêdê û Nivêja Rojhilatê” vedibêje.

|                                                                                                                |                                                                                                                                                                                                                                                      |
|----------------------------------------------------------------------------------------------------------------|------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------|
| + Lautarchiv                                                                                                   |                                                                                                                                                                                                                                                      |
| <b>Kurdisch (französische Kolonie), Erzählung - LA 1478</b>                                                    |                                                                                                                                                                                                                                                      |
| 1) Der Sprecher ist von der Religionszugehörigkeit her Zoroastrier und gehört somit dem Zoroastrismus an. S.M. |                                                                                                                                                                                                                                                      |
| <b>Detailangaben</b>                                                                                           |                                                                                                                                                                                                                                                      |
| Eintragstyp                                                                                                    | Tondokumente                                                                                                                                                                                                                                         |
| ID                                                                                                             | 22973                                                                                                                                                                                                                                                |
| Inventar-Nr.                                                                                                   | LA 1478                                                                                                                                                                                                                                              |
| Sachtitel                                                                                                      | Zwei Gebete der Eyzidi-Kurden (Morgengrauen, Sonnenaufgang).                                                                                                                                                                                         |
| Datierung                                                                                                      | 1937-01-28                                                                                                                                                                                                                                           |
| Beschriftung                                                                                                   | a) [gedruckt:] Institut für Lautforschung a.d. Universität Berlin, Sprachaufnahme, [handschriftlich, mit Tinte:] La 1478, 1) Morgengrauegebet, 2) Sonnenaufganggebet, Kurdisch-Ezädi, Gespr. v. Prinz Kamuran; b) [maschinenschriftlich:] P, LA 1478 |
| Format                                                                                                         | 30 cm                                                                                                                                                                                                                                                |
| Sprecher / Sänger                                                                                              | Kamuran Ali Bedir-Chan                                                                                                                                                                                                                               |
| Aufnahmedauer                                                                                                  | 04:11 min                                                                                                                                                                                                                                            |
| Erhaltungszustand                                                                                              | gut                                                                                                                                                                                                                                                  |
| Herkunft                                                                                                       | [Nordsyrien]/ Mactale-Syrien [?], nahe Aleppo [Aleppo, arab. Halab]                                                                                                                                                                                  |
| Sprecher                                                                                                       |                                                                                                                                                                                                                                                      |
| Land (historisch)                                                                                              | Französische Kolonie                                                                                                                                                                                                                                 |

Wêne 4: Agahiyên derbarê qeydiya LA 1478- <https://www.sammlungen.hu-berlin.de/objekte/lautarchiv/22973/>

#### 4) Qeydiya çaremîn: LA 1479 (wêne 5)

Qeydiya çaremîn di arşîvê de ya dawî ye û ew jî wek “belgeya deng” ketiye arşîvê de. ID ya qeydiyê 22973 û hejmara envanterê jî LA 1478 e. Bi sernavê “Du diayên kurdên êzîdî (Diaya miriyan û diaya dawîn)” di arşîvê hatiye qeydkirin.<sup>14</sup> Dîroka qeydiyê dîsa 1937-01-28 e. Cihê qeydiyê jî wek yên din; koloniya fransî, Bakûrê Suriyeyê, derdora Helebê ye. Vebêjer Kamiran Ali Bedirxan e (Kamuran Ali Bedir-Chan). Formata qeydiyê 30 cm û dem jî 4 deqîqe û 17 saniye ye.

<sup>14</sup> Kamiran Bedirxan van diayan wek “Nivêja miriyan û Paşnivêj” vedibêje. Îhtimaleke mezin ev diayên di her du qeydên dawî de rê daye ku yên arşîvê Kamiran wek yekî “li ser ola Zerdeştî” bidin nasîn.

|                                                                                                                |                                                                                                                                                                                                                                       |
|----------------------------------------------------------------------------------------------------------------|---------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------|
| + Lautarchiv                                                                                                   |                                                                                                                                                                                                                                       |
| <b>Kurdisch (französische Kolonie), Erzählung - LA 1479</b>                                                    |                                                                                                                                                                                                                                       |
| 1) Der Sprecher ist von der Religionszugehörigkeit her Zoroastrier und gehört somit dem Zoroastrismus an. S.M. |                                                                                                                                                                                                                                       |
| <b>Detailangaben</b>                                                                                           |                                                                                                                                                                                                                                       |
| Eintragstyp                                                                                                    | Tondokumente                                                                                                                                                                                                                          |
| ID                                                                                                             | 22974                                                                                                                                                                                                                                 |
| Inventar-Nr.                                                                                                   | LA 1479                                                                                                                                                                                                                               |
| Sachtitel                                                                                                      | Zwei Gebete der Eyzidi-Kurden (Totengebet, Schlussgebet).                                                                                                                                                                             |
| Datierung                                                                                                      | 1937-01-28                                                                                                                                                                                                                            |
| Beschriftung                                                                                                   | a) [gedruckt:] Institut für Lautforschung a.d. Universität Berlin, Sprachaufnahme, [handschriftlich, mit Tinte:] La 1479, Kurdisch, Ezîdl, 1. Totengebet, 2. Nachgebet, Gepr. v. Prinz Kamuran; b) [maschinenschriftlich:] P, LA 1479 |
| Format                                                                                                         | 30 cm                                                                                                                                                                                                                                 |
| Sprecher / Sänger                                                                                              | Kamuran Ali Bedir-Chan                                                                                                                                                                                                                |
| Aufnahmedauer                                                                                                  | 04:17 min                                                                                                                                                                                                                             |
| Erhaltungszustand                                                                                              | gut                                                                                                                                                                                                                                   |
| Herkunft                                                                                                       | [Nordsyrien]/ Mactale-Syrien [?], nahe Alepo [Aleppo, arab. Halab]                                                                                                                                                                    |
| Sprecher                                                                                                       |                                                                                                                                                                                                                                       |
| Land (historisch)                                                                                              | Französische Kolonie                                                                                                                                                                                                                  |

Wêne 5: Agahiyên derbarê qeydiya LA 1479-<https://www.sammlungen.hu-berlin.de/objekte/lautarchiv/22974/>

## Deşîfrasyona qeydên dengên

Deşîfrasyona qeydên dengên di Arşîva Dengan (Lautarchiv) a Zanîngeha Humboldt-Berlînê de bi vî rengî ne:

### 1) Deng- 14740100 (LA 1474)

Bi navê Yezdanê pak ê dîlovan û Mihriban

Dinya sar û zivistan bû, ez bi çend hevalên xwe ve, bi rêbûwarî li gundekî Kurdistanê de mêvan bûm. Mêvandarê me Herekol axa bû. Herekol axa zelamekî pîr, zelamekî heftê salî bû, lê ne sist bû. Xurt, jêhatî û niktedan bû. Gelik hej zaroyên xwe dîkir. Şevêkî min jê re got, (Herekew-) Herekol axa ka ji me re ser zaroyên xwe tiştêkî bibêje. Herekol axa go, ez ê ji we re lori'kê bêjim. Loriya wî gelek xweş bû. Wisa dest pê kir.

Binive xweşiya dil û du çavan, dadê ji te re her ro nîgehban.

Tê de lo lo jî hebû. Min jê re got, Herekol axa tu dikarî ji min re bêjî çend zaroyên te hene.

- Ma çawa ezbenî, belê, got Herekol axa, ez ê bêjim we. Şanzdeh zaroyên min hene, deh ji wan kur in, şeş keç in. Di navbeyna hevalên xwe de zabitekî ingilîz bû. Zabitê ingilîz ji min re got, keremke ji axê bipirse, kurê wî ê ciwan çend salî ye?

Min ji axê pirs kir, axa her wekî zêrek û jêhatî bû, zû miraz çi ye seh kir, ji min re go, ezbenî kurê min ê ciwan çend salî ye, bi Xwedê nikarim ji te re bêjim, ji lewre jina min avîs e. Şevêkî din, şevên zivistanê dirêj in, em bi hev re runiştibûn, min ji wî re got,

- Herekol axa keremke ji min re serborî û serhatinên xwe tişteki bibêje.

Herekol axa got,

- Ez benî, gawa ez ciwan bûm, ne serekî gund û 'eşîr bûm. Serekîti ser bavê min bû. Di wî wextî de, ez di zêviyên bavê xwe de dixebitîm, rojekî (rohê) rohelat bû, dinya sor, zer, gewr, heşîn, bi rengên wusa xemilandî bû, min gîsinê xwe fikir 'erdî, erdî dikelaşt, ji erdê kal û kalikê Kurdistanê, bêhna 'erdê dihat, bêhnekî xweş û ter.

Min ji xwe re got, Herekol (bi xwe-) bi Xwedê, roja jîna te a delaltir, dema jîna te a delaltir ev dem e, ku ti bêhna 'erdê ter seh dike.

Noho ez ê ji we re çend methelokên kurdî bibêjim.

- Heval heval e, lê bira delal e.

Jê tey seh kirin, hevalîti gelek mezin e, gelik sipehî ye, wek destbiratî, lê biratî jê jî delaltir e.

Methelokê din jî bêjim:

- Kirmanç dibêjin, "Şêr bi lepê xwe, Şêx Adî nayê hawara te".<sup>15</sup>

## 2) Deng- 14750100 (LA 1475)

Bi navê Xwedê yê rojhelat, rojava û ronahiyê

*Tirba spî û dûvê peritandî*

Ciwanek hebû, şivan, bilurvan bû. Dengê bilura wî di Kurdistanê de di gund û bajar û di nav 'eşîran de bi nav û deng bû. Carek di zewiyê de bilura xwe dixist, dît ji kunekî marek derket û bi dengê bilura şiwên, bi kêfxweşî reqîsî. Piştê ku reksa xwe kedand û vegeriya kuna xwe û jê re zêrek anî û avêt ber şivên. Şivan gelek dilxweş bû, êdî her ro, dihat wê derê û bilura xwe dixist, û mar bi kêfxweşî direqîsî û jê re zerek tianî. Paşî çend mehan şivan dît, ko dewlemend bûye, ji

<sup>15</sup> Ev "medhelok" di nivîsa Celadet Alî Bedir-Khan de jî cih digire ku bi sernavê "merhele" di hejmara yekem a *Roja Nû* de çap bûye. bnr. Roja Nû, hj, 1, rp. 2. Duşemb, 3 Gulan 1943.

xwe re got, divê ez î herim mala Xwedê tewaf bikim, divê ez ê jî bibim hecî. Ban kurê xwe kir, û jê re mes'ela marî qise kir, û serde zêde kir û go, bê Xwedê meke ku tu ser talankirina gencîneya marî marî bikujî. Kurê wî got,

- Bavo, ez î dînitîyek wusa tu car nakim!

Bavê wî got, xweş e.

Kurê şîwên êdî her ro dihat vî zeviî û bilura xwe dixist û mar jê re zêrek tianî. Paşî çend rojan şîwan ji xwe re got,

- Ez ê heya kengî xulamîtiya vî marî bikim, ez î wî bikujim, û gencîneya wî talan bikim. Şurê xwe kir destê xwe û hat ser kunî marî sekinî. Marî ji kûna xwe derket, hema zaro şurê xwe avêt ser dûvê marî, dûvê marî peritand, lê marî jî xwe bilind kir, û kurikî veda û birîndar kir. Xelkî gund dîtin ko kurê şîwên venagere gund, çun pey û dîtin ku kurik miriye, laşê wî xera bûye, nepixiye, jê re tirbakî spî awa kirin û têtîde veşartin. Paşî çend mehan hecî veşariyan, bavî kurkî ji xelkê gund pirs kir, û got kurê min li kwî ye, jê re mes'ele çi ye gotin, mêrik zu seh kir, dîsa bilura xwe xist destê xwe û çû û bilura xwe lêxist. Marî ji kûna xwe derket, lê tenî bi serî xwe. Û got, êdî tu çima hatiye wan dera? Şîwan got ma em ne hewalê hev in, ez dixwazim ji te re dîsa bilura xwe pê kim. Marî got, êdî navbeyna me de hewalîti nemaye, ber çavê min de dûvê min ê peritandî, ber çavê te de tirba spî.

### 3) Deng- 14780100 (LA 1478)

#### Nivêja Spêdêyê

Bi navê Yezdanê pak ê dîlovan û mihrîvan

Xwudêyo, ji bona şanê te, şuna te, ji bona padîşahiya te

Ya Rebbî tu kerîm î, tu rahîm î, tu Xwudayî, tu melîkî mulkî cîhanê

Mulkî sûq û sema yî, melîkî erşê ezîm î,

Ya Rebbî tu ji enzel da qedîm î,

Ya Rebbî, ta ebed tu kama ruha yî

Ya Rebbî, tu melîkî cin û uns î, melîkî erşî kursî yî

Ya Rebbî tu samd û lept û nema yî

Ya Rebbî, tu samd î vexy'el mecîd î, Yek û yekta û bê embaz î

Ya Rebbî her tu layiq î medh û sena yî

Ya Rebbî tu Xwudawendî spehrî, Xudanî mah û mihr î, Xwûdanî çem û nehr î

Ya Rebbî, tu Xwudawendî ata yî,  
 Ya Rebbî, tena loma, tena îmdada, tena awaza, tena renga, tena denga, tena çenga  
 Ya Rebbî, kes nizanî tu kûsa yî  
 Ya Rebbî, tu guhrende yî xok î, menda yî kut î, tu helîm î, melekût î  
 Ya Rebbî, tu hakîm î şeh û geda yî,  
 Ya Rebbî, herê ha yî, herê ha yî, herê ha yî

### Nivêja Rojhelatê

Bi navê Yezdanê pak ê dilovan û mihrîvan  
 Ya Rebbî, tu heyî, ez nîn im, tu rehm î, ez guneh, tu xwudan heqqî, ez bende  
 Tena çûna tu yî çend î, tuna bejna tu yî bilind î, tuna awaza tu yî bi deng î  
 Cihî te hemî ‘erd e, tu xaliqî cumle yî alem, te daye Hezretî Adem  
 Te kir dimame ew dem,  
 Ya Rebbî tu ne mîna me dikî, dibêjî  
 Ya Rebbî, tu welî yî, ferza nivêj î, tu rihan ji rihan dipirêjî  
 Tu ji seran rihan diavêjî,  
 Tu ne mîna me kêr dibînî, tu li seran rihan digehînî  
 Ya Rebbî, tu Xwuda yî, tu padîşahî alemî ûlema yî  
 Tu hûnkarî ser çend padîşahan î  
 Tena xafa, tena xurde, tena awaza, tena denga  
 Xwudan mal î, xwudan perde, cihê te hemî ‘erd e  
 Tu Xwudayî, derdimendim  
 Bexşendeyî, bê gunehî, layiqî medh û sena yî  
 Kes nizanî tu çawa yî  
 Tu hem derd î, hem derman î  
 Hakimî şah û geda yî  
 Ya Rebbî, tu padîşahê erşî kursî, xaliqî ga û masî yî  
 Ya Rebbî, bi hatirî navê xwe ke,  
 Halê Kurdistanê û yezîdiyên rojhelat û rojavayî bipirse.

**4) Deng- 14790100 (LA 1479)****Nivêja Miriyan**

Bi navê yezdanê pak ê dîlovan û mîhrîvan,  
 Hey benî Ademo, miskîno, jaro ademo,  
 Ev dunya mestanxane ye, wek xewna şewan e  
 Felek siha daran e, her ro yara hinan e  
 Ka Suleymanî hikum dikir, ka Belkîsa nav dikir  
 Tu jî xweş be, ewan guya ji xwe re tev dikir  
 Ka Suleymanî peyxemberan, ka Belkîsa bi zêrî zeran,  
 Tu yê xweş be, ew jî çûn, nav ax û beran  
 Kanî Xidir, kanî Îlyas,  
 Kanî derwîşê bi tesbîh û wekas  
 Tu yê xweş be, ew jî di nav axê de kirin qiyas.  
 Benî Adem, li vî dunyayî mebe timah,  
 Ev zêr û malî gelek meke cim'a  
 Dinya bo Resulê Xwedê jî nema

Ev dinya 'erdê Derwîşe,  
 Ev tîy de digerin cumleten ji êş e  
 Kesek bi nefsa kîbar naçe pêş e  
 Kanî Xemze, kanî 'Elî,  
 Kanî ewliya, kanî enbiya  
 Ew di nav gorinê de bûne totiya.  
 Mala gorinê çende kûr e û çende tarî  
 Tejî mar e, tejî mûr e  
 Ya Rebbî tu dikarî du aşikan ji yek bikî du,  
 Werin, werin xizm û lezim  
 Wê gawî giriya me bêt, da û sed kovan û keser,  
 Xelki şêrîn, lev'nê şekir nema bidin xeber  
 Qewî giriya me bê  
 Huzn û girî bê fêde ye,

Gor û kefen mala me ye  
 Megrî, menal, hêstiran ji ruyê xwe bimal  
 Ev دنیا bo peyxemberê Xwedê jî nema  
 Werin, werin lêzim, werin  
 Em îro gelek bigirin, helkê merga vemirî  
 Heçî ya dike, ew mîr dike  
 Xeyr û şeran xefîr dike,  
 Daxa dilan bapîr dike.

### **Paşnivêj<sup>16</sup>**

Bi navê Yezdanê pak ê dîlovan û mîhrîvan  
 Amîn, amîn, amîn  
 Xwedê arîkarê dîn  
 Ya Rebbî, xeyra tu bidî, şera wergerînî  
 Şemseddîn, Fexreddîn, Îmadeddîn, Nasreddîn  
 Heko tu padişahî, xwudanî mîhrî mah î,  
 Rezaqî cin û uns î,  
 Xwudayê alema kutsî  
 Xaliqê cin û ins î  
 Şerefeddîn garze gul î  
 Mizgîniyê bibin Kurdistanê  
 Bila vekin deftera îmanê  
 Şêsems roja êzîdiyan e  
 Şerefeddîn mîr e li dîwanê  
 Şêlixan biketin Kurdistanê, wê tofan berbidin Turkistanê  
 Textê raketin bibin Kurdistanê, Qeda wê bikevit mala Erebaşanê

<sup>16</sup> Varyanteke vê diayê di nav berhevkerinên Hugo Makas de jî cih digire ku ji Pîrê Ezîdiyan (Pîr Hasan) berhev kiriye. Bnr. Makas (1900: 37).

### Nirxandin û encam

Di arşîva dengên a Zanîngeha Humboldtê de bi tevahî em rastî çar qeydên dengê kurdî hatin ku ew jî yên Kamiran Bedirxan in. Li gorî agahiyên li ser malperê ev deng ji “koloniya fransî” hatine tomarkirin û di 1937an de ketine arşîvê de.

Ev deng dîsa li gorî agahiyên katalogî di 01-28-1937an de ketine arşîvê. Wê demê an jî berî wê hatine qeydkirin. Ji ber ku wê demê radyoyeke fransî bi navê Radio Levant (an Liban) jî heye û Kamiran Bedirxan jî li wir dixebite, dibe ku kopyayên qeydên wê radyoyê bin, an jî bo radyoyê hatibin amadekirin. Li ser pirsê “gelo ev deng çawa çûne Almaniyayê?”, mirov dikare vê yekê wek ihtimalekê bîne ziman.

Ji hêla din, piştî avabûna Komara Tirkiyeyê, ji ber sedemên polîtîk Kamiran Bedirxan û birayê xwe Celadet û Sefder berê xwe didin Almaniyayê. Celadet di 1925an de vedigere Şamê, lê Kamiran wextekî din li wir derbas dike û xwendina xwe ya doktorayê diqedîne (Henning 2018; Keskin 2018; Keskin 2025). Di vê maweyê de têkiliyên wî bi gelek derdoran re çêdibin û xuya ye ev têkiliyên wî piştî vedigere Bêrûdê jî dewam dikin. Wek mînak helbestên wî ji hêla Curt Wunderlich ve bo almanî tên wergerandin û di 1935an de li Berlînê bi navê *Der Schnee des Lichtes –Berfa Rohniyê* tên weşandin (Bedir Khan, 1935). Her weha di 1937an de jî pirtûka wî û Herbert Oertel a bi navê *Der Adler von Kurdistan- Eyloyê Kurdistan* çap dibe (Bedir Khan & Oertel, 1937). Balkêş e, dîroka têkatina qeydên dengên bo arşîvê jî 1937 e. Lewma, her çiqasî ew li Bêrûdê be jî zelal e ku têkiliyên wî yên bi Almaniyayê re dewam dikin. Û ihtimaleke mezin bi rêya van danûstandinan ev qeydî şandine Almaniyayê. Lê, çawa, bi rêya kî/kê, ne diyar e.

Qeydiya pêşî serboriyeke Kamiran Bedirxan bi xwe ye û ihtimaleke mezin dema vê serboriyê jî sala 1919 e ku Kamiran û Celadet Bedirxan bi zabitê ingilîz E. W Charles Noel re serdana hin bajarên kurdan kiribûn (bnr. Noel, 2014), ji ber ku di serboriyê de îfadeya “...zabitê ingilîz..” derbas dibe.

Qeydiya duyemîn, wek di kataloga arşîvê de jî derbas dibe, fabl/çîrokeke kurdî ya gelêrî ye ku Kamiran Bedirxan wek “Tirba spî û dûvê peritandî” bi nav dike.

Qeydên sêyemîn û çaremîn jî ji diayên kurdên êzîdî pêk tên û ihtimaleke ji ber vê yekê ew agahiya xelet a destpêkê ku dibêje “axeber girêdayî ola êzîdiyê ye” ji ber van diayan e.

Arşîv hafîzeyê civakê ne û di navbera doh û îro de pirekê çêdikin. Arşîvên dengên jî di vê çarçoveyê de dengên paşerojê bi me didin naskirin. Dengên kurdî yên kevin di arşîvan de kêmtir û her weha dengên kesayetiyên navdar wek Kamiran Bedirxan ku bûye mijara vê xebatê, kêmtir

in. Peydakirin û weşandina wan dengan ne tenê denge wan kesayetiye giring bi me dide naskirin, lê di heman demê de me ji axaftina wê demê jî haydar dike û tevkarîyekê jî li mîrata çandî ya kurdî dike. Her weha bi xwe re giringiya avakirina arşîva dengên kurdî jî derdixe meydana.

### Çavkanî

- Bedir Khan, K. A (1935). *Der Schnee des Lichtes* (wer. C. Wunderlich). Berlin
- Bedir Khan, K. A. & Oerte, H. (1937). *Der Adler von Kurdistan*. Potsdam: Ludwig Voggenreiter Verlag
- Bedirxan, K. A. (2025). *Kulîlkên Ezêb- Hemû Berhemên Menzûm*. Stenbol: Avesta
- Birdsall, C. & Tkacz, V. (2019). Listening to the Archive: Sound Data in the Humanities and Sciences. *Technology and Culture*, Volume 60/ 2 Supplement (April, 2019). r.1-13. <https://muse.jhu.edu/pub/1/article/727296/pdf>
- Harrison, H. P. (1987). The Archival appraisal of sound recordings and related materials: a RAMP study with guidelines. [Ji bo Bernameya Agahiyên Giştî û UNISIST hatiye amadekirin]. Paris: Unesco.
- Henning, B. (2018). *Narratives of the History of the Ottoman- Kurdish Bedirhani Family in Imperial and Post-Imperial Contexts*. Bamberg: University of Bamberg Press
- Henning, B. û yê din (2019). *Kamiran Alî Bedirxan (1895-1978)*. (wer. H. Bucak & H. İlhan). Stenbol: Avesta
- Kardaş, C (2017). *Aşgîn Sazı, Dengbêjin Sesi- Dengbêjlik ve Aşıklık Üzerine Karşılaştırmalı Bir İnceleme*. Ankara: Eğiten Kitap
- Koch, L. & Wiedmann, A. & Ziegler, S. (2004). The Berlin Phonogramm-Archiv: A treasury of sound recordings. *Acoustical Science and Technology*. 25. r. 227-231. DOI:10.1250/ast.25.227. [https://www.jstage.jst.go.jp/article/ast/25/4/25\\_4\\_227/pdf](https://www.jstage.jst.go.jp/article/ast/25/4/25_4_227/pdf)
- Keskin, N. (2016). *Müzik, Anlatı, Kimlik: Tûr-Abdîn'de Bir Anlatım Biçimi Olarak Mırtıplık*. Ankara: Gece Kitaplığı
- Keskin, N. (2018). *Roja Nû û Edebiyata Kurdî ya Gelêrî-1*. Stenbol: Avesta
- Keskin, N. (2025). *Kamiran Alî Bedirxan û Edebiyat. Di nav Kulîlkên Ezêb- Kamiran Alî Bedirxan-Hemû Berhemên Menzûm de*. Stenbol: Avesta, r. 19-24.

- Noel, E.W. C. (2014). Kurdistan 1919- Binbaşî Noel'in Günlüğü. (wer. B. Birer). Çapa 3yemîn. Stenbol: Avesta
- Makas, H. (1900). Kurdische Texte und Studien (2 Cild). Amsterdam: Apa- Philo Press
- Ong, W. J. (2003). Sözlü ve Yazılı Kültür. (çapa 3yemîn). İstanbul: Metis yayınları
- Orak Reşitoğlu, S., & Keskin, N. (2024). The Role of French Intellectuals in the Development of Kurdish Studies and Kurdish Enlightenment. *International Journal of Kurdish Studies*, 10(2), 391-410. <https://doi.org/10.21600/ijoks.1527699>
- Shorter, D. E. L. & Borwick, J. (1980). Sound recording, transmission and reproduction. In *New Grove Dictionary of Music and Musicians*, vol 17, r. 567-90.

*Nîşe: Ez dixwazim spasiya serokê koleksiyona Lautarchiv a Humboldt-Universitât zu Berlin, Dr. Christopher Li, û her weha birêz Charly bikim, ji bo comerdî û alîkariya wan di pêvajoya bidestxistin û şandina van qeydan de.*

**Note:** *I would like to thank the head of the Lautarchiv collection at Humboldt-Universitât zu Berlin, Dr. Christopher Li, and also Mr. Charly Bischoff, for their generosity and assistance in the process of obtaining and sending these recordings.*